VOCO GmbH
Knowledge Communication Department
Anton-Flettner-Str. 1-3
27472 Cuxhaven
Almanya

info@voco.de
www.voco.dental

VOCO Profluorid Varnish

Danasîna Berhemê:
VOCO Profluorid Varnish vernîkeke proflorîdtêkirî ye ku ji bo baştirkirina rûber û mînaya diranan tê bikaranîn. Ew ji bo remîneralizekirin û florîdkirina madeya diranê ya hişk amrazê îdeal e.
Bi saya afirandina ya ji reçîneya xwezayî VOCO Profluorid Varnish xwe bi rûberên ter ve jî xwe digire û li hember terbûna domdirêj û gilîzê xurt disekine. Di hundirê vernîkê de ksîlîtol jî hatiye lêzêdekirin. Digel taybetmendiya xwe ya başkirina tamê, ksîlitol li hember xerabûna diranan jî xwedî têsîr e.

Naverok (û yên din):
VOCO Profluorid Varnish reçîne, aromaya çêkirî, sodyûm florîd, û ksîlitolê dihewîne.
1 ml VOCO Profluorid Varnish ji 50 mg sodyûm florîda hevtayê 22,6 mg florîdê dihewîne.

Têsîrên Rexnak:
- VOCO Profluorid Varnish reçîne û aromaya çêkirî dihewîne. Eger hestiyariyên (alerjiyên) we li hember yek ji kereseyên VOCO Profluorid Varnish hebin wê bikarneynin.
- VOCO Profluorid Varnish divê ji aliyê nexweşên xwediyê birînên ûlserî li goştên dordiranî û mûkosaya navdevî ve neyê bikaranîn.
- VOCO Profluorid Varnish ji bo dermankirina sîstematîk nayê bikaranîn.

Komên Armanckirî yên Nexweşan:
VOCO Profluorid Varnish dikare ji aliyê herkesî ve bêyî astengiya temen û zayendên wan bê bikaranîn.

Taybetmendiyên Berhemê yên Xebatbariyê:
Taybetmendiyên berhemê yên xebatbariyê li gor armanca bikaranînê û standardên berhemê yên pêwendîdar diguherin.

Şêweya Bikaranînê:
Bikaranîna VOCO Profluorid Varnish bi kesên profesyonel ên ku di diransaziyê de perwerdedîtî ne tê birêvebirin.
Rêjeya Pêşniyarkirî:
- Ji bo kesên xwediyê diranên şîr dora 0,25 ml VOCO Profluorid Varnish
- Ji bo kesên xwediyê diranên şîr û mayinde, yan jî tenê diranên mayinde dora 0,40 ml VOCO Profluorid Varnish

Qateke VOCO Profluorid Varnish ya zirav li ser mînaya diranê ya hişk bigerînin. Qateke stûr bi hêsanî ji rûbera dirên radibe û ti feydeyekê wê ya terapatîk çênabe.

Amadekarî:
Cihê melhemlêkirinê bi temamî ji kevirên diranan paqij bikin. Ji bo ku encamên baştirîn bên standin, divê hemû şilemenî û gilîz ji cihê melhemlêkirinê bê derbirin.

Bikaranîn:
VOCO Profluorid Varnish bi awayekî hevpar li ser diranan belav bikin da ku qatekê zirav xwe li ser hemû rûberê dagire. Cihê melhemlêkirinê ter bigirin (yan bi rêya avtêwerdanê yan jî bi gilîza xwezayî) ji bo ku VOCO Profluorid Varnish baş rûdine.

Hîn Zanyarî / Balkişandin:
- Li nexweşan divê bên şîretkirin ku heta 4 sateran piştî dermankirinê bila xwarinên hişk nexwin, alkol nestînin, diranên xwe firçe nekin û bendê navdiranan bikarneynin.
- Kêm caran zexmiya daqurtandinê ya ji ber odemgirtinê, bi taybetî piştî melhemkirina rûberên berfireh, hatiye ragihandin.
- Herwiha piştî bikaranîna dermanên hevreng gelek kêm caran zexmiya hilmkişandinê digel zarokên bi astimê hatiye ragihandin.
- Nexweşên xwedî sistemekê herisê ya lawaz dikarin piştî dermankirinekê berfireh ji ber dilrabûnê zexmê bikişînin.
- Digel Hîpersensîtîvîteyê: Bi firçeyekê diranan ya nerm û bendê navdiranan ve vernîkê jêbibin, piştre bi ava nîvgerm têwerdin.
- Roja dermankirinê tu tiştên din ku florîdê dihewînin bikarneynin.
- Heta çend rojên piştî dermankirina bi VOCO Profluorid Varnish ve standina tabletên florîdê rawestînin.
- Vernîkê danequrtînin.

Embarkirin:
Di navbera 4°C – 23°C de veşêrin. Piştê borîna roja bikaranînê ya dawî bikarneynin.

Jiholêrakirina Bermayiyan:
Jiholêrakirina bermayîyên vê berhemê li gor zagonên herêmî pêk bînin.